

# 15’ê TEBAXÊ

## Roja Vejîna Gel



Ali Husein Kerim

**Seneryo: Ali Husein Kerim**
**Nîgarsaz: Mihail Mihai Alexandru**
**Teknik redaktor: Cezar F.**




# Hejmana Taybet

Di sala 1923'an de angoreyî pêymana Lozanê Kurdistan kirin çar parçe û her parçeyek kirin bin destê dewletekî. Herwusa hêzên dilreş biryara kolekirina kurdan hildan. Ji wê rojê pêve Gelê Kurd jî, ji bo azadiyê biryara serhildanan wergirt. Lê mêtingerên her çar parçeyan dest dane hev û êriş anîn ser gel. Ne digotin mezin ne jî piçûk; jin, mêr û zarok bi sedhezaran mirov qirkirin. Bi mîlyonan ser xaka wan ajotin. şikence û lêdan, zîndan û kuştin, zelûlî û xêzanî herwaha zulm û zordarî bibû karê wan ê rojane.

Lê bi rikê hemû kiryarên dagirkeran Gelê Kurd ê her çar parçeyan qet caran hêvî û baweriya xwe ya azadiyê wendanekir. Ji bo mirovan av, hewa û xwarin bingehê jîyanê ne. Ji bo Gelê Kurd pêdiviyên bingehîn ên jîyanê ne tenê sisê, çar hebin: Av, hewa, xwarin û azadî.








Dewleta mêtinger, şûrê xwe yê ku hê xwîna kurda jê dinuqutî car din tûjkir û zivirand ser gel. Ango dagirkeran ji bo xwînrêjî û qirkirinên nû kudeta pêkanîn. Her hêlên Kurdistanê kelehê zulmê avakirin. Ji nav van yek jî



















**Lê belê, lawên Gelê Kurd ên hilbijartî, ev derfet nedan dagirkeran. Hember hemû cure guwişar û şikencan Rêber gotin: “Berxwedan Jiyane.„ Vê durişmê çîngînî di**


ZÎNDANA DIYARBEKIRÊ
"Li vê derê Xwadê nîne û pêxember çûye iznê"
Ez qet caran dev ji doza xwe bernadim û poşman jî nabım.
Tiştak ji destê me bê em texsir nakin. Ji vir ha ji bo bilindkirina prestij û parastina
Mazlum Doğan, Newroza 1982'yan sê qirşikê kibrîtê vêxist û Newroz Pîrozkır û paşê çû ser dilovaniya xwe. Ev agirê sê qirşikên kibrîtê bû mezinttirîn tirsa kedxwaran. Ji ber ku ew agirê dilsoziyê bû gerdîşa roja bilindkirin û hêzkirina tekoşîna azadiyê. Herwaha di Zîndanên Amedê de dîroka berxwedanê carek dîsa dubarekir û payebilind Mazlum Doğan bû Kawayê Hemdem.
Eger tu poşmaniya xwe diyarbikî û bibî mirovê dewletê emê
Newroz Pîroz be hevalno! Bila Newroz bibe sembola Berxwadana gelê Kurd. Bila Agirê Newrozê bibe tirsa dilên Mêtingeran.








- Avê lênekin, reşandina avê îxanet e, vî agirî
18'ê gulanê Şeva Çaran despêkır. Lawên Gelê Kurd ên hilbijartî Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Mahmut Zengin û Necmî Öner dijî zulm û zordariya dewleta Faşist Agir
Armanca kudeta 12 İlonê ya leşkerî, pêkanîna siyaseta bêkesayetiyê û îxanetê ye. Heya nuha me hevî dikir ta ku em bikaribin berevaniya siyasi bikin. Lê heyf û mixabin ve ev maf neda me. Herwaha, Mazlum û Ferhatan ji bo protestokirina vê helwesta dewletê jiyana
ADELET MÜLKÜN TEMELİDİR


Kemal, ma tu heznaxwazî
Ne rast e. Em hewqasî pir hezkarê jiyanê ne, ta ku seba wê
Xatirê we hevalno, xatirê we dostino,
Ezê ji dest bi rojiya mirinê
Kowuşa 35min dê
Ew dê bibe goristana kê dê paşê diyar be. Ez jî
- Bibîzin Feryada mirovan, Kurdistan
Em jî hene, em jî






Dema ku ez mirim li ser kêlê turba min binivisinin " deyindarê gelê xwe li vê derê radizê,,
**Kemal Pir** 7ê ilona 1982 jiyana xwe ji dest da. **Memet Hayri Durmuş** 12ê ilona 1982 jiyana xwe ji dest da. **Ali Çiçek** 17ê ilona 1982 jiyana xwe ji dest da.
Bijî tekoşina gelê me, Bijî
Stêrkên berxwedanê bilindî nav ezmanên Kurdistanê bûn û mizgînîya serkeftinê dan gelên bindest. Zindanên dujmin êdî bûne kelayên berxwadanan.
Li dervayî welêt şoreşgerên Kurdistanê ji bo tekoşîna dîrokî amadekariyên mezin pêkdihanîn. Ji bo bikaribin dijî dujminê xwînxwar rawestin, dest bi perwerdên siyasî û leşkerî kirin.
**Piştî gelek amadekarî û perwerdeyan vegera welêt destpêkir. Diviya îjar dijî dujminên xwînxwar şerê gerila**


Keremke, xwîşka me derbas be
Na ez dixwazim em bi hevra herin. Berê bi tirsa xirabkaran em neweribûn tenê bigerin.
Ev balafiran ji bo çi wusa zêde
Ji bo tirsê bixin dilê gel. Bêxem be. Dê rojek bê ew wusa serbest nukaribin di
Li wê derê zozanan
Nav nêrgiz û sosinan
li bin pelên bêhna cateriyê
konek reş vedane.

Di bin vî konereşî de
hêvî û xewnên koçeran
bi gul û rihanan hatine hunandin.
Gava ku kale kala berxan,
dengê bilûra şivanan bilindibe
û di sertaser ê geliyan de holan
dide
hingê mirov pêdihese ku
nepenî û nehînîyek di nav wê
holanê de veşarti ye.
Ev dengê qudretê
mina bayexwaşê havînê bedena
mirov dialêse
dibe merhema birîna hezar salan

bersiva wê jî tilîliyek dirêj û zîz
û
çend gotinên xêrxwaz in
û dibêjin:"Heval hatin heval,,


Herwusa,
hertişt şêwexezayî û hevseng e.
Lewra hingê
dilovanî û hilovanî diniqute ji
rûgeşan
û dibe îksîra bêmirinê.



Ka ez ji we ra çîroka rastiyan bêjim. Ev sedan salin em benda roja azadiyê ne. Bav û bapîrên me bi hesreta wê roj û demê mirin û çûn. Lê nuha em bawerdikin ku gelê me jî dê azad be. Ji ber ku helwest û refdara gerilayan ne wek yên berê ne. Di
Berê xwe bidin çiyê, çiyan. Bi tenê çiya dost û


Belê wusa ye. Dujmin ti rêyên dine nehêla ye. Divê em serkev in
Bawer dikim ev rêwîtiya me
Binyêrin eger em durist kar bikin gel dê ji dil û
Heval Egit, me rehberek peyda kir.
Emê heya wî gundÊ hanê herin.
Ma ev hevala dê rê nîşanî me bike
Belê heval Egît, ev ê me bibe








Heval nase te li vî
Heval ev der gundê min e. Paşê hewcê nîne hûn kesî nas
Halê we, rêwşa we
Berê li vê derê Xelo´yê zalim hebû. Bi dara zorê mal û milkên me ji me distend. Jinên me direvand. Piştî ku hûn
Belê. Ew jî dizanin ku tekoşîna me dijî hemû cure
Ez di çavên we de bîr û bawerî û serkeftinê dibînim. Tu
Serokê me rêya rast û durist nîşan daye. Bi sedan hevlên me di zîndanan de ji ber vê doze jiyana xwe ji dest dan. Ji


Hêlîn û meskenê me çiya
Heval Selim,Tu bajarê Eruhê
Belê Heval Egît,
Weey hûn xêr hatin. Kekê min. Keremkin hûn ji bo xwe kavireki
Em ne ji bo mal û mulkên we talan bikin, seba biparêzin derketin serê van çiyan. Eger pêwist be emê heqê wan bidin.
Hella hella, gelo ez xewnê dibinim. Kesên berê wan destevala







Angori telimatên Serokatiyê û komita navende dive em
Hetta em dereng man, diviya ji mêjve me
Çavên we ronahibin. Biryar gihîşte destê me.
Hevalê Bedran,
Geli hevalan, ew roja ku em bendêbûn hat. Ango roja pirkirina hemû kiryarên qirêj ên mêtingeran hat. Partiya me Yekîneyên Propaganda Çekdarî daxûyan kir. Navê van Yekîneyan jî HRK, ango Hêzên Rizgariya Kurdistanê


Rasti jî êdî sebra min
Fermandar Mahsum Korkmaz(Egîd) derbarê çalakiya 15'ê tebaxê rojenivîsa xwe de waha destnîşan kiribû: Herwusa, çar salan me sînorên gelek dewletan derbaskir û di nav welêt de amadekarî pêkanî. Herwaha ew dema ku ji mêjve em bendê mabûn êdî hatibû.Hingê dilê min gelekî rehetbûç cara despêkê ev gotin ji nav lêvên min derket:“Başe, lê em pir dereng man, mêjve pêkbihata.„ Çi dibe bila be, berya hertiştî ev agahî di nav me de bû sedema kêfxwaşiyek pir mezin. Subetirê me civînek darizand, daxûyaniya HRK'ê û destûra rêvebirina Yekîneyên Propaganda Çekdarî hat xwandin. Piştî wê, angoreyi destûrê dema ku me







Her çi kesên amadene destên xwe
Bijî Partiya Karkerên Kurdistan, Bijî Hêzên
Naha jî
Ji bo herdem giredayî gel û partiyê bimö ji bo di nav hemû merc û şertan de tekoşînê berdewam kim,
Apo Hate Hîlvanê, şewqa xwe da Sîlwanê
Ha pêşmerge Bavê min lêxin herdu çavên min,


Geli hevalan navê yekineya me ya Propaganda Çekdarî ya 14'ê Tîrmehê ye.
Bijî Partiya Karkerên Kurdistan, Bijî Hêzên Rizgariya






Ji bo çalakiya leşkerî Egîd û
Min nexşa cihên
Binyêre ev payga
Piştî kifşa bajêr grup vegeriya li cem
Çawa bû we kifşa wê derê
Belê Heval Egîd. Me
Başe bila hemû heval bicivin emê biaxifin. Gelî hevalan


Hevalno civîn heye
Gelî hevalan. Emê nuha amadekariyên xwe binyêrin, ka çiqas erzax û cebirxana me heye.
Hemû çek û rext kontrol kirin.
Erzaxê xwe amade
Gelekî baş e. Divê nuha jî em li ser makêtê bajêr çend
Heval çek û rext temam in. Erzaqê me yê ji bo hefteyekî jî








Egîd bajarê Eruhê nîşanî hevalên xwe kir û Binyêrin hevalno, hedefa me yak u emê êrişbikin ev


Hemû heval
Hevla Erdal û Şiyar emê naha carak din nave gruban bixwînin.
Amadekarîyan bê kêmanî encamp da.
Hevalên ji bo parastina
Bi tevî kordîne û fermandariya








Ji bo êrişa ser lojmanên subayan Gruba heval Bedran amadebûn
Ji bo êrişa ser payga leşgerî di bin fermandariya Erdal heft gerila hatin hilbijartin.
Ji bo propaganda di nav gel de gruba heval Şîyar
Grubek wê di hoperlora Mizgeftê de belavokê bixwîne
Grûbek jî wê êrişî ser Bankê bike.


Hevalno, we hedef dît. Ev sê rojin me ser makêtê wê jî amadekarî çêkir. Nuha dema me ya nivisandina dîrokê ye. Despêkê emê êrişî payga leşgerî bikin. Hedfên duyemîn lojman û gazinoya subaya ye. Hedefa sisemin ketina bankê ye. Di vê navberê de belavok tên belav kirin. Paşê gel dê
Erdal û gruba wî çûn ser paygehê.
Bedran û gruba wî çûn ser lojmanên
Serkeftin hevalno
Fermandar Egîd e, dr. Baran û









Piştî ku sê rojan ser maket prova xwe qedandin, car din vegeriyan Kaniyamîra. Ev dever cihê kifşê ye. Ji wê derê re hemû bajarê erûhê dihate dîtin. Hemû
15 Tebaxê 1984, gruba Propaganda Çekdarî, ya 14 Tîrmehê bervî bajarê Erûhê
Xetên telefonê qutkirin.
Gruba çû ser paygehê nobedar xistin


Roket avêtin paygehê û bi dengê moşekê gurminiyek
Grubên dinê jî angoreyi plansaziyê karên xwe
Bi navê gel
Teslim
Hemu eskerên Pygehê teslim








Qaymeqam û biroqratên bajêr hemu jî teslim bûn û xwe wek welatparêzan dan
Li gazinoya subayan de yeki tabance teqand û gerilayek ji destê xwe
Şiyar û koma wî li çayxan+e dest bi propagandayê kirin.
Angoreyi plansaziyê avêtin ser lojmanan
Deriyên bankê asêbûn, ji ber vê egerê


Hinekî dereng mabe be jî gruba mizgeftê bi rêka mikrofonê axaftin pêkanî.
Şiyar û koma wî li çayxan+e dest bi propagandayê kirin.
Sebirkin hevalno. Hêşta ev despêke, demek
Heval hûn xêr hatin. Me jî hildin nav refên xwe.
Dest dan li ser hemû tiştên li paygehê







Leşgerên êsir hanîn pêş Egîd.
Hevalno, em jî dizanin ku, hûn bi riza dilên xwe nebûne leşkerên dewleta Faşist. Ji ber vê egerê em nuha bi nave gelê Kurdistanê we terhis dikin. Keremkin herin
Sagol, varol
Hemu tiştên bi kêrhatî yên paygehê li erebeki


Hûn bêxembin xalo can. Ew dem jî wê bê. Nuha em bi rêya şerê gerila gejdikin. Suberojê jî hûnê bi
Heval ka bêjin emê çibikin. Vezifa me dê çibe. Eger hûn dixwazin
Xazî em jî hildana nav
Dema ku nûçeya êrişê belaw bû,  Di sertaserê Kurdistanê şahiyek mezin ket







Nav seatekî de hertişt qedya û Koma Propaganda Çekdarî ya 14'hê dîsa Tîrmehê vegeriya nav dilên
Ev bajara, Eruha ku haja kesî lê nîne, îro pêde herkesê ji


Emê li vêderêhinek î bêhna xwe hildin. Heval Selim tu jî van tiştên me dest dan ser
Çek û cebirxaneyên ku ji dujmin wergirtibûn binaxkirin û ser jî
Angoreyi nêrinên hevalan zêde kêmasiyên
Belê hinek kêmasiyên piçûk jî hebûn tevahiya
Ji bo nivisandina destanên nû Fermandar Egîd û teyrebazên Kurdistanê her dimeşiyan.






Şiiiiişt pss pss
Hey geli cînaran, ma gelo we bihistiye Partiyê Artêş
Fermandar Egîd ev bi zanetî wusa got. Gundî ji xandina belavokan û pirtûkan zêde hali nedibûn. Lê bi vî tewrî gotin, di demek nêzik de her derê belav dibe.



## DESTANA VEJINÊ

Ev welat tijî geşt û seyrange ne
xume xum û lime lima çem û ava ne
çiya û deşt, gelî û zozan
hezar car hezaran bi gul û rihanan
nexşîn , xemili û kemilî ne.

Ev cîh û war Serokaniya Jînê ye
Ji vir têdizên Kûr û Erez
hertim bi gurme gurm û bileze lez
dikişin diçin ji çiyayên Qafkasan re
hênik dikin kevsera dilê Prometheus
ta ku rizgar bibe ji destê Zeus.
Bi geş û serbilind
xwe berdidin li nav germahiya derya Xezarê.

Ji vir têdizên Dîcle û Firat
Dikişin diçin bê west û bê rawest
Jinê didin deştên qelandî yên Mezopotamya Jêrîn
herdu evîndar dest didin hev
xwe davêjin ji kendalên tengava Hurmuz
mîna du kevokên spî wendabin nav ezmanên hêşîn
Dengê baskên wan berzedibe li nav dengê pêlên derya gujîn.





Ji vê axê têdizê Avasor
Ji pey xwe dikişîne dibe
bi dehan çem û kaniyan û
xwe berdide nava sîngê derya reş.

Lê Seyxan û Ceyxan
Serokaniya wan ji vî welatî ye
Ji zozanên Torosan dertê û
Bi hezaren hêviyan didin ber xwe û diçin,
dibin hevîrtirşikê bereketê
ya axa deştên avis yên Kilikya,
paşê wek mirovên ji kêf û şadiyan têrbûyî
bi hemû şûxx û şengê
wek tîra Mîtra rikêf dikin nav Derya Spî.

Ev welat bi deşt û Kohistan e
Bi Toros û Zaxrosan
hestiyê pişta Mezopotamya jorîn û jêrîn e.
Bi zozanên rengîn û şengîn
ev der: Hêlîna Sîmurg e bê mirin e
Sîmurg li vê derê bi xwelîya xwe vejîn dibe.
Dibêjin, her cara ku Sîmurg divejîne
hereket û bereket,
azadî û serbestî,
xweşî û başî,
ronahî û dilpaqijî
hemû bihevre serdest in.
Hingê Sîmurg ji sîng û berên xwe
ta ku dadyarî û qencî serkeve
Zerdeştekî nû,
ta ku zulm û zordarî binkeve
Hesinkarek hemdem datîne jêr.

Ev welat deverek pir nav û deng e;
hinekan jêre gotine welatê pişt heft çîyan,
hin kesan gotine welatê heft qat li ezmanan,
hin kesan gotine deryê cîhana bin erdê,
hin kesan gotine welatê dêw û cinan.
Pir kesan jî jêre gotine:
Payîtexta Xweda û Xwedawendan.

Ma kêr çi tên
zumrûd û yaqûd û almas,
eger tunebe bextê xwaş!

Tişta baş dibe balkêş
Tişta xweş dibe tamkêş

Ji pey vê
hatin û hatin
hê jî tên dagirker û xemreş.

Dema ku wan berê xwe dan similên sorgenimê vê xakê gotin:
Ev e filîzê ku sîmyager pey digerin
Kingê çavên wan bi zeriyên zer ket
Gotin: ev in, yên ku
Habil û Qabîl ji bo wan hev kuştin.
evin hûrî û fêriştê,
ev e kaniya zemzemê,
ev e ava heyatê,
ev e hulma jîna bextewar.
Yeqîn ev der e Buhuşta wendayî ya Kîsra.

Hebûn û cîwanî xwaş û baş e





Mixabin pir caran
dibe sedema êriş li ser êrişan,
rikêf li pey rikêfan.

Hatin, hatin û hatin.
Hukumdar û desthilatdaran
Bi hezaran salan ajotin ser vê xakê û dagirandin
Hêz û xurtbûna xwe li vê derê ceribandin.
Kuştin û sotin
Koledarî û ajotin
Bibû egera pesn û payebilindiya wan.

Hemû jîndarên vî welatî digotin:
Heya kingê hewqas zulm û zordestî
Bese êdî bese ev bindestî

Êdî dem hatibû
Ewrên jor bi tovê azadiyê avisbûn
Ji ezman daketin xarê
Jîn dane xwaliya Teyrê Sîmurg
Ew ji xewa bi hezaran salan hişyarkirin.

Sîmûrg
bi hemû heybet û kerameta xwe
Zerdûştek anî danî jêr
Kawa û Rostemên hemdem danî li qada mehşerê
ta ku dadyarî û azadî serkeve,

Ji nav per û baskên xwe yên pîroz
mizgîniya berxwedanê hilbijiqand
Tev tîrêjên Mîtra yên sor û mor
tîra azadiyê pekand ji kewanê

qelişand û çirand sebra bêdawî ya Zurvan.

Fîqa sûr a Îsrafîl deng da
ta yên xewa xefletê jî şiyarbûn.

Zerdeşt got:“Em vê qederê napejirînin“
Kawayên hemdem bersiv da û got: “Berxwedan Jiyane”
Bersiva Rostemê Hemdem:“Cenga me ji bo serkeftina
rastiyê ye”
Ji wê navberê de piraniyê bi hevra gotin:”Em ji mirinê
natirsin”

Çend hevdengên xerîb,
ên ji aliyê Pontûsa Kevnar
bi tewrekî xaş û geş ber bayê bakûr ketin
û çingînî bi teht û latan hat
ew xwaş sedayan
tevî li melankoliya ahengên blûra kurdewarî bûn
Digotin:
“Guh nedin gef û leftên drug û dewayan
pêş pêş hevalno hertim di pêş da!

Bêbawer û tengezaran gotin: “gelo mirî jî zindî dibin?
ji granîtan re gulpikên gulan dertên?
çol û çolistan hêşîn dibin?
gelo, dilên bi qeyd û çîdarên tirsê hûnandî diwêrin?
gelo hişê xewarê xewaran şiyar dibin?
yan jî çevên neyarperestan vedibin ?”

Hulm û tîna ahenga nû bersiv da û got:
”em jînê ji mirinê dertînin
Ji xwaliya şewitiyan bîsoya birînan hiltînin.





Ango em, êgir bi agir ditemirînin
Ji ber van egeran
Tekoşîna me bi qedr û qîmet e
rastî duristî, qencî û hevalti ye
tiji sipas û hîmmet e.
Em ranawestin
ta ku dildar û evîndar serkevin“

paşê
yekcar ji aliyê hîva çarderojî
Înnana bi hemû çelengiya xwe,
lendên xwe yên dagirtî
zivirande ser xaka tehnî
û şîrê xwe yê zelal bijiqand
û got:“Dayîkên vî welatî
keçên xwe bi şîrê helal mêtandin.
Ji hezaran salan pêve
Min şewqa hêjabûna xwe
ji şîrhelalên vê xakê wergirt
îro ew ne bi tenê beşdar û paldar in
êdî keçên vê xakê
ne fedîkarên pişt perdê û lêçegê ne
bitekûz
ew rêber û cengawer in.”

Lê,
zordar û sîtemkar ji xwe bawerbûn
Digotin:
“Me buhuşta muxayyel li pişt çiyayê qaf,
li quntara çiyayê Agiravêj binaxkirye
hîmê turba wê bi zinarên ristimî,
ser wê jî heft qat car heft ji betonê ye,

Me xaka vê buhuştê parçe parçe kir,
havîrdorên wê têlên rêçayî û leximkirî ne
her derên wê
bi qerewil û payigan şev û roj çavdêr in
ji bo xêr û berên wê bimijin,
me ew wek bêjingê qul qulî kir ye.
Ya herî girîng,
me wusa kir: Ta ku ew bibin evîndarên celadên xwe
bila şînê re bêjin geşî
şahiyê re jî reşî!

Bi dehan, bi sedan çerx zivirîn
bi hezaran sal û wext buhurîn
Rojek ji rojên buharê
Gulên vêjînê
Bi hemû xweşî û çelengiyên xwe ve
Bi rikê koledaran bi rengê rengan xemilîn
Herwusa
Carek dîsa selimî ku
ticaran namire tovê jîne
û
hertim benda hilma vejînê ye ew!


Êdî perda dawiyê ya şanoya koledaran vebû
Zordar, sîtemkar û durûxkeran biryar hildan,
Gotin dilovanî ne karê me ye
divê dîsa
heft qat zulum û şikence
heft qat girtin û kuştin
heft qat tarûmarkirin bêrawest pêkbînin.
Herwaha, ta ku dîsa heft car heft qat bêton
Bavêjin ser turba buhuşta muxayel
divê carek din gorbegor bikin ta herhereyê !



Nişkeva,
Roja panzdehê tebaxê
sisemîn perdaya azadîxwazan vebû
beşa hûnandina hizir û hêzê hat darizandin
Rastî jî ev beş:
Qasî hewara Dawud biheybed
û sebra Eyub bibawer e.

Dem dubihurin,
sal mîna leza hespê rewan dikişin

Rastî
roja Panzdehê tebaxê
gulek e ji nav baxçê gulan qet caran naçilmise,
ew stêrka ezmanê bilind e herdem diçirûse!
Ji ber vê,
Ew roj bû roja bextewariya bindestan,
Ew cejin bû buhara xêrxwazan!!



**BİBLİYOGRAFYA**

Curbesur hejmarên Rojnama Serxwebûn li ser Berxwedanên Zindanan
Rojnama Serxwebûn Mazlûm Doğan
Dörtlerin Gecesi
Serxwbûn, Berxwedana 14'ê Tîrmehê
Taylan Turmen, hevpêyvin bi Fevzi Aydin re, ji çapemeniya kurdî
Ronivîsên Mahsûm Korkmaz